# Daxuyanîya Dawî ya Kongreya Niştimanî ya Kurdistanê

**Ji bo netewa Kurd a leheng û bi sebir li derve û nav Kurdistanê!**
**Ji bo hemû partî û rêxistinên Kurd û Kurdistanê!**


**Silabên azadî û serxwebûnê**

Kongreya Niştimanî ya Kurdistanê di 18/4/2009an de li Londonê bi tevlêbûna serokatîya KNC, nûnerên komîteyên KNC yên li nav û dervê Kurdistanê û hejmarek endamên parlemanê, dostên netewa Kurd ên li dervê welêt, kesayetîyên Kurd, nûnerên partî û sazîyên Kurdistanê hat lidarxistin. Kongreyê li Navenda Çandî ya Îrlandî seet di 10.00an de bi dirûşmên "serxwebûn ji bo Kurdistanê", "yek netewe, yek welat, yek ala û yek dewleta serbixwe ya Kurdistanê" dest pê kir. Ji bo çavdêrîya kongreyê ji hevrêyên birêz Şîrwan Kawsî, Goran Dargazenî û Pawa Xoşraw Xarîb komîteyek hat pêkanîn.









Bernameyê bi bibîranîna têkoşîna hevrêyên me yên rehmetî General Azîz Akrawî, mamosteyên me Ahmed Hardî, Rehber Celal Mamiş, Dr Muzafer Partoma, Abdulrezaq Suxta, Profesor Salah Jmor, hevrê Farhad Zenalûş, hevrê Abdulqader Dabaxî, hevrê Îhsan Fûad û hemû şehîdên netewa me yên bê hejmar dest pê kir, û bi sirûda netewa Kurd "Ey Reqîb" vebûna kongreyê hat daxuyanî kirin.

Dûre Dr Cewad Mella sîyasetên KNC di navbera kongreya 5an û 6an de bi kurtî pêşkêşî guhdaran kir. Piştî wê, Xanim Pawa Xoşraw Xarîb bi Îngîlîzî xêrhatin da mêvanên biyanî û yên Kurd.

Seet di 10:30an de, nameyên pîrozbahîyê yên van kesayetîyan bi Îngîlîzî hatin xwendin: Serokwezîrê Brîtanyayê Birêz Gordon Brown, Şaredarê Londonê Birêz Boris Johnson, û endamê encumena şaredarîyê Antony Lillis, endama kabîneya Şaredarîya Hammersmith.

Li dû van nameyan çend axaftinên Îngîlîzî ji alîyê van kesan ve hatin kirin: Xanim Irmgard Îbrahîm, Dr Hanne Kuchler – endamê Yekîtîya Rojnamevanên Alman, Birêz Andrew Sloughter, Endamê Parlamentê – Partîya Kar (Labour), Xanim Merlene

Emerson, berendama parlamentê –Partîya Lîberal Demokrat, Birêz Jonathan Fryer, berendamê Parlamena Ewropayê – Partîya Lîberal Demokrat, Birêz Harûn Darfurî – Tevgera Dad û Wekhevîyê ya Darfûr, Birêz Abdullah Syahuyî, endamê komîteya birêvebir a Tevgera Netewî ya Belûcîstanê, Birêz Kawa Yûsif, KNC Ciwan, û Birêz Sardar Pişdarî, sîyasetmedar.

**Di beşa duyem a rojevê de, van nûnerên sazî û komîteyên KNC, kesayetî û nûnerên partî û rêxistinên Kurdistanê axaftinên xwe kirin:**

1- Birêz Şêx Latif Mariwanî, endamekî damzrêner ê KNC.
2- Birêz Brûska Îbrahîm – serokê karûbarên derve yên KNC.
3- Birêz Azad Mafko – endamê birêvebirîya KNC – Rojhilat.
4- Birêz Rebwar Nalasî – serokê KNC li Belçîkayê.
5- Mesaja Navenda Helebçê “CHAK” ji alîyê Birêz Hadî Babaşêx ve.
6- Xwendina mesajeke ji Partîya Serxwebûna Kurdistanê.
7- Birêz Faraydûn Marûfî – endamê komîteya Partîya Demokratik a Kurdistanê li KY.
8- Mesaja Federasyona “Yarsan” li Swêdê.
9- Nivîskar û sîyasetmedar Dr Jaza Chingiani.
10- Mesaja Partîya Rizgarîya Kurdistanê.
11- Birêz Îbrahîm Xelîl –nûnerê Partîya Yekîtîya Demokrat a Kurd li Sûrîyê.
12- Birêz Kawa Xorasanî – nûnerê Kurdên Xorasanê.
13- Mesaja Partîya Rastîya Kurdistanê.
14- Birêz Nabaz Torî – serokê KNC li Swîsrê.
15- Xwendina mesajek û du helbestan ji bo salvegera 50an a “KAJYK”, ji alîyê helbestvan hevrê Tanya Ako.

**Piştî xwendina mesajên partî û rêxistinên Kurdistanê, mamosteyê me û damezrênerê ramana zanyarî ya rizgarî û serxwebûna Kurdistanê, Cemal Nebez, di salvegera “KAJYK” ya 50an de sedemên avakirina ramanên wê û rewşên taybetî ku di nav de hat**









**damezirandin, bi kurtî pêşkêş kir.**

Dûre navên van partî, kesayetî û rêxistinên ku mesajên pîrozbahîyê ji bo Kongreya 6an şandibûn hatin xwendin:
1- Birêz Boris Johnson – Şaredarê Londonê. 2- Lord Jeffery Archer – KY. 3- Şêx Murşîd Xaznawî – lawê şehîd Şêx Maşûq Xannawî – Norweç. 4- Mesaja Cîhgirê Şaredarê Londonê Birêz Richard Barrens. 5- Mesaja Birêz Muhammed Ahmedyan – Norweç. 6- Mesaja Şêx Omer Xarîb – DYA. 7- Mesaja KNC – Rojhilat (rêxistina nav welêt). 8- Mesaja Birêz Serheng Çîya – Swêd, 9- Mesaja hevrê Simko Alî – nûnerê KNC – Skandînavya. 10- Partîya Azadîya Kurdistanê. 11- Rêxistina Têkoşîna Şoreşger a Kurdistanê (Rojhilat). 12- Dr Wria Rewandûzî – Vienna. 13- Mesaja hevrê Şiwan Berzencî – serokê KNC li Norweç. 14- Partîya Rizgarîya Kurdistanê. 15- Birêz Hacî Suleyman / Binka website – Almanya. 16- Prens Charles – Prensê Wales – KY. 17- Mesaja Mamosta Omed bavê Bextîyar. 18- Birêz Muhsîn Jwamer – nivîskar. 19- Birêz Tariq Namiq – Hewlêr – Başûrê Kurdistanê. 20- Birêz Kerîm Surenî–Hamburg-Almanya. 21- Birêz Khalid Rauf – serokê KNC li Almanya. 22- Mamosta Karzan Şarabanî – KY. 23- Dr Muhammed Saleh Gaborî – Başûrê Kurdistanê. 24- Birêz Abdulrahîm Gaborî – DYA. 25- Arkeolojîst Mamosta Abdulraqîb Yûsif – Başûrê Kurdistanê. 26- Birêz Osman – Bakurê Kurdistanê. 27- Birêz Kak Alî Mahmûd – Navenda Helepçê (CHAK). 28- Birêz Norman Leinster – serokê Beşa Rojhilata Navîn– Wezareta Karên Derve – KY. 29- Lord Hylton-KY. 30- Birêz Medenî Ayhan – Bakurê Kurdistanê. 31- Birêz Hamîd Qlijî Beray, Institute Elamirkan. 32- Hevrêyên KNCyî ji hemû beşên Kurdistanê û ji dervê Kurdistanê, bi telefonê, bi faksê û email pîrozbahîyên xwe şandine.

**Kesayetî û rêxistinên jêrîn jî tev li Kongreya 6an bûn:**
Hevrê Mamosta Muhammad Shaida, Birêz Adnan Shaswar, Birêz Ahmad Dado, Dr Ahmad Shamo, Birêz Ahmad Şêxmûs,









Xanim Amîna Abdulqadir Dabaxî, Birêz Ara Kamil Jeer, Birêz Azad Mîraniî, Birêz Bangîn Araf, nivîskarê Brîtanî Birêz David Adamson, Birêz Fawaz Abi, Xanim Freshta Rapper, Birêz Hadi Saraj, Mamosta Hacî Omed, Birêz Yûsif Zangana, Xanim Gemma Crowther, Birêz Adil Azîz û hevjîna wî, Birêz Hakam Kharsa, Birêz Hamza Bayezidî, Birêz Hashim Karimî, Xanim Homa Razayan, Birêz Îbrahîm Bayezidî, Birêz Îbrahîm Xalîl, Birêz Jan Osman, Dr Jamal Abdullah, Xanim Najia Xan, Mamosta Newroz û hevjîna wî, Birêz Kemal Sabrî Beg, Xanim Şîrîn Sabrî, Birêz Kawa Bahaştî – serokê Partîya Demokrat a Kurdistanê – Îran li KY, Birêz Kawa Nebez, Birêz Khosraw Gharib, Xanim Bana Khosraw Gharib, Xanim Leyla Barzanî, Birêz Kawa Kona Bush, Dr Muhammad Mustafa, Birêz Muhammad Saleh Kerkûkî, Birêz Mawlûd Swara – Partîya Demokratik a Kurdistanê – Îran li KY. Xanim Nerîman Îbrahîm, Birêz Nûrî Balakayetî, Birêz Rizgar Hacî, Birêz Rodîn Mustafa, Dr Samî Khafaf, Birêz Serhang Huseyn Parsa, Xanim Gîtî Parsa, Birêz Simon Rowley, Birêz Sîpan Osman, Birêz Yûsif Gilgil, Birêz Wîjdan Derkî, Xanim Zubayda Huseyn, Dr Saman, Birêz Mella Huseyn, Xanim Ionela – dîrektorê Civaka Romanî li KY, Birêz Fûad Mustefa, Dr Alan Muhamed Ali, Birêz Majîd Salayî, Birêz Omed Dîwandara, Birêz Sarwat Alî – nûnerê Partîya Sosyal Demokrat a Kurdistanê, Dr Farhan Ahmed – nûnerê Komela Dostanîya Kurd û Brîtanî. Birêz Şiwana Muhamedî, Xanim Marta Sandra, Birêz Rizgar Çavşîn, Birêz Hawsar Alî, Birêz Muhammad Mirawî, Birêz Awat Mûrad, Birêz Wafa Rostamzada, Birêz Habîb Sadiqî, Birêz Omar Nebez, Birêz Rebîn Omar Saleh, Birêz Şiwan Bradostî, Xanim Aimee Woollard, Birêz Darûn Hawramî, Birêz Cîhad Baker, Birêz Samir, û Birêz Soran Kawsî ji Norweçê.

Pêşde di nav rojevê de dor hat ser hilbijartina serokê KNC ji bo dewra di navbera Kongreya 6an û 7an de. Hevrê Şîrwan Kawsî ji hemû beşdaran pirsî ku kî












amade ye û bi bawer e ku dikane erkên sîyasî û netewî yên KNC di vê dewrê de birêve bibe û ji bo wê xwe bike namzed. Dr Cewad Mella axaftinek kir û got: “Divê em jî çanda xerab a sîyaseta Rojhilata Navîn teqlîd nekin, ku serok heta bi heta li ser hikum dimînin, divê em wan biguherînin”. Piştî dîyarkirina nêrînan û gotûbêja mijarê, beşdarên kongreyê doza ji nuh de hilbijartina wî kir û bi piranîya dengan “Dr Cewad Mella” wek serokê KNC hat hilbijartin.




Sitranbêjê navdar Adil Hawramî seet di 17.00an de hat û ji guhdaran re axaftineke kurt kir.



Divê bê gotin ku li gel vexwendina fermî ya PDK û YNK bo kongreyê, ew tev lê nebûn, heta ji sazîyên medyaya wan jî kesek nehatibû. Ji dewsa medyaya Kurdî, “Al-Jazeera” TV hatibû hola kongreyê û li ser armanc û biryarên KNC pirs û lêpirsîn kirin û rapor kirin, û di êvara wê rojê de nûçeya Kongreya 6an ji bo bi milyonan temaşevanên seranserê dinyê weşandin …



**Di beşa dawî ya rojevê de hevrê Şîrwan Kawsî, xalên jêrîn xwendin û piştî ku pirsên li ser hin mijarên pêşniyarkirî sitendin, biryarên jêrîn ên Kongreya 6an ji alîyê hemû dengdêran ve hatin belêkirin:**

- Kongreya 6an nirxeke bilind dide serfirazîya gelê Kurd a hilbijartinên herêmî li Bakurê Kurdistanê û mesaja pîrozbahî û piştgirîyê dişîne ji bo DTP û gelê Kurd li Bakurê Kurdistanê!
- Kongreya 6an ji bo hemû awayên tevgera rizgarîya gelê me yên li hundir û dervê welêt ku hêza erjeng a dagirkeran li ser netewa Kurd û welatê wê qels dike piştgirîya xwe dîyar dike!
- Kongreya 6an plan û êrîşên domdar ên rejîmên dagirker ên Tirkîye û Îranê li ser Başûrê Kurdistanê nalet û şermezar dike!
- Kongreya 6an ji serokên hemû partî û rêxistinên li hemû perçên



Kurdistanê dixwaze ku ji mesaj û axaftinên ku hisên netewî yên gelê Kurd diêşînin û zirarê didin yekîtîya netewî û berjewendîyên netewa Kurdistanê, dûr bisekinin!

- Kongreya 6an careke din piştevanîya xwe ya deklarasyona navnetewî ya mafên mirovan dîyar dike û piştgirîyê dike li gel hemû hikûmetên dinyaya azad ku li dijî teror û dîktatorîyê şer dikin!
- Kongreya 6an ji partî û rêxistinên li Rojhilatê Kurdistanê dixwaze ku cudatî û nakokîyên xwe bi rêya civîn û dîyalogê çareser bikin û li hemberî rejîma dagirker a Îranê enîyekê ava bikin!
- Kongreya 6an tayîna delegasyonekê belê dike, ku civînên Kongreya Netewî ya Kurdistanê KNK û Kongreya Netewî ya Kurdî ji bo Bakurê Amerîkayê saz bike ku ji bo hevkarîyê û damezirandina kongreyeke yekgirtî ya bi tevlêbûna partî, rêxistin û kesayetîyên sîyasî û yên nesîyasî yên Kurdistanê, li ser bingeha raman û prensîpên netewî xebatê bikin.
- Kongreya 6an ji Hikûmeta Herêma Kurdistanê dixwaze ku ji bo hilbijartinên azad rê bide ku bi bingeha rêzgirtina mafên Kurdan ên sîyasî, civakî û netewî, û rakirina gendelî û otorîtarîzmê hikûmeteke nuh ava bike. Ev hikûmeta nuha encameke xwîna rijandî ya şehîdan û trajedî û fîdakarîyên bê hejmar ên netewa Kurd e. Lewra erk û vatinîya rayedarên herêmê ye ku rêzgirtina têkoşîn, armanc û daxwazên netewa xwe bikin û rê bidin ku heta ku dibe zû li Kurdistanê hilbijartinên azad pêk werin!
- Kongreya 6an ê ji nûnerên partîyan û hemû alîyên ku tev li Kongreya nuha ya di 18/4/2009an de bûne komîteyekê hilbijêre ku li gora ramanên netewî û armancên gelemperî yên netewa Kurd platformeke yekgirtî ava bikin ku bi partî û alîyên ku tev li Kongreyê nebûne re hevdîtinan saz bikin û wan









qane bikin ku bibin endamên vê platforma hevbeş!

- Wek ku di dokument û Kongreyên KNC yên berê de hat qalkirin, em ji Kongreya 6an dixwazin ku piştgirîya referandûmeke giştî li Kurdistanê di bin çavdêrîya NY û welatên dinya azad de bike ku gelê Kurd bikanibe bi azadîyeke giştî li ser çarenûsa xwe biryarê bide!
- Kongreya 6an ji rayedar, desthilatên hiqûqî yên Iraqê û ewên Herêmê dixwaze ku li gora biryarên dadgehê yên li dijî krîmînalên li dijî gelê me tev bigerin û nehêlin ku ew birevin an jî sitargehan nedin ewên ku tev li jenosîd û komkujîya gelê Kurd bûne. Kongreya 6an her weha dixwaze ku krîmînalên ku li Welatên Ewropayê dijîn bi biryarên dadgehên wan bên girtin û li gora qanûnên li dijî jenosîd û paqijîya etnîkî bên dadgehkirin.
- Kongreya 6an ji hemû partî û rêxistinên Kurdistanê dixwaze ku li dijî dagirkerên Kurdistanê yek bin. Dagirkerên Kurdistanê sitratejî û armancên yekgirtî hene ku netewa Kurd biqedînin; lewra divê em jî yek bin û bi hev re planên dagirkerên Kurdistanê pûç bikin, û netewa xwe ya dîlgirtî û welatê xwe ji nav destê dagirkerên xwînxwar rizgar bikin!
- Kongreyê pêşniyara Serokatîya Başûr a KNC belê kir ku dema ku rewş musaît be, Kongreya 7an a KNC li Başûrê Kurdistanê li dar bixe!

Piştî hilbijartina Dr Cewad Mella wek serokê KNC û di 19/4/2009an de, serokatî û hejmarek endam û çalakvanan, çalakî û têkoşîna sazîyên KNC ên li hundir û dervê welêt pêşçav kirin, û hevrêyên jêrîn heta Kongreya bê ya 7an wek serokên organên KNC hilbijartin:

1- Hevrê Brûska Îbrahîm, serokê karên derve yên KNC.

2- Hevrê Şîrwan Kawsî serokê









înformasyon û medyaya KNC.
3- Hevrê Azad Mafko serokê têkilîyên li gel girse û partî û rêxistinên Kurdistanê.
4- Hevrê Goran Dargazenî serokê KNC Radyo.
5- Hevrê Sîpan Osman serokê têkilîyên KNC li gel tevaya web.

Em vê daxuyanîyê ji bo gelê me û hemû kesayetî, partî û rêxistinên Kurdistanê dikin.
Ev daxuyanî yê her wisa bi zimanên din jî bê weşandin û ji rojname û kanalên televîzyonan re bê şandin.
Kongreya 6an, sipasîya hemû kesên ku bi xwe yan bi mesajan tev li kongreyê bûne dike. Kongreya 6an sipasîya hevrê Şiwan Bradostî, Aimee Woollard, Dr Muhammad, Muhammad Saleh, Hakam, Kawa, Xanim Homa dike ku erkên mazûvanîyê û ewlekarîya Kongreyê bi awayekî rast û rêkxistî bicîh anîne.
Kongreya 6an bi sirûda netewî “Ey Raqîb” bi serketinî bi dawî hat.






Bila alaya pîroz a azadî û serxwebûna Kurdistanê bilind li ba bibe!

**Kongreya Niştimanî ya Kurdistanê - KNC**
22/4/2009